

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdê Sûriye û Libanê: 15 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 15 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDÎR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Bîrc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanê.

CENG & SIYASET

DEWRAN

AZAHÎ - SERBESTÎ

ARMANCA HEMÎ MÎLETAN

Miletên mezî û biçûk, mîna peyayên mezî û biçûk, dewle mend an belengaz hewcedarî azahî û serbestiyê ne.

Şert û şeref û meqama insaneî a bîngêhîn, azahî û serbestî ye.

Mîrov zana an nezan bin, qala azahî û serbestiya xwe dikin, ji ber ko hê azahî û serbestî, ta'ma jiyîne nîne, rahetî û pêşveçûn nîne, xweşî û kamiraniyê nîne. Ji xwe, heywan bi xwe, aşiqê azahî û serbestiyê ne, teyrin hene ko gava tene xistin rîke «qefesekê», serê xwe dixin çar aliyên xwe û xwe dikujin, dilê teyrê biçûk bi hestîyê qîma xwe nayîne û mirîne jê çetîr digire.

Şerên dinyayê ên mezî, ji bona azahî û serbestiyê çêbûne û ev gerê mezî jî, ji bona azahî û serbestiya mîletên cihanê çêdibe.

Mîletê ko radibe û dike axatiya mîletekî din bike, ji qesda xwe çî pêş me dike?

Ji vî armancê xuya dibe ko ew xwe jî, mîletê din hejratîr dihesibîne û dike vî mîletî li ser hisabê xwe biçûkxulîne, çîre? ji ber ko jê xurtir e, jê dewlemendtir e.

Û di wîcanê cihanê qebûl na ke ko xurtî û dewlemendiya mîletekî bibe kaniya zîlm û zorkeriyê, ta'da û neheqiyê, û xurtî û dewlemendiya wîlo, yê ko sebeba perîşanî û kambaxiya însaniyê ne, divê bîne şkenandin û ji dest standin.

Mîletên dinyayê hemî xwedî heq û serbestiyê ne û di warê heq û serbestiyê de, mîlet hemî mîna hev û du ne, ji hev û du ne kêmtir in; ko mîletekî mezî û heja destê mîletekî biçûk bigire, û di karên pêşveçûnê de, arikariya wî bike, rêberiya wî bike, lê gîk tişteki din e, tişteki bîkerhatî ye. Azahî û serbestî bi çend gotînine kurt û vekirî ev in:

Azahî û serbestiya zîman, azahî û serbestiya axaftin, nivîsandin, xwendina zîman, azahiya vekirina dibistanan, çapkirina rojname, kovar û kitêban, azahî û serbestiya mîletekî ji bona gerandina kar û îşên xwe, bi destê xwe. Mîlet divê mehkeme, polîs û cendîrme, memûr û karker, bi gotînekê hikûmeta xwe bi destê xwe deyne û bigerîne.

Azahî û serbestiya dîn û diyanetan, ol û bawerîyan. Mîsilman, êzîdî, file an cuhlî xelkên welatekî di karên dîn û diyanetê de, divê bi timamî bibin serbest, bawerîya her kesî qedirgiran e û kuren welatekî, dîn wan her çî jî be, mîna hev in, dost û destbrayê hev in, qedera wan yek e, para wan jî bar û xweşiya welêt mîna hev e.

Serfiraziya Hevalbendan

LONDRE:— Bomdardimana hejagehên Germanistanê û yê Ewriya Vegirtî bê êtlaî dom dike. Bajarên elemanî ên mezî mîna Berlîn, Brunswick, Frankfurt, Kolonye, Stuttgart bûne kaviî û xerabezar. Rojî hene hezar û heta hezar û pênc sed bombeavêj û neçîrwan bi ser axa Germanistanê re digirin û 2—3.000 ton bombe berdîdî hejagehan û bi sedan ve torpîl dirêşînin şet û robarên erdê elemana û yê axa vegirtî.

Di eniya talyanî de, li Anzio û Netunoyê, her sê êrîşên elemanî hatine şkenandin û heta niha eskerên Hevalbendan 5.300 hêşîr girtine.

Di eniya sovyetî de, pêşveçûna yekîneyên Ordiya Sor dom dike. Eskerên rûsî gihane pêşiya Ostrovê, qîwetine rûsî ên din ber bi Tallîne ve dimeşin, payetextê Estoniyê.

Narva tengiyêke giran de ye, ko ev bajar jî hate standin yekîneyên rûsî rast bi rast bikevin erdê Estoniya Bakurî.

Di navbira Pskov û Ostrovê de xelên elemana hatine neqeb kirin. Di axa Bîrmanyayê de, yekîneyên Ordiya Çardehan di bakurê Buttdongê de, zehf çeper û Kozikên Japona jî dest ve girtine; Japona bi qesda vegeandina wan penahan ber-êrîş kirine, lê bê netîce. Di Pesîfikê de, qîwetên Hevalbendan dest bi vegirtina giravîne nû kirine, giravên Emîraliyê hatine standin.

Savar - Hawar Ceng

Em kurd dibêjin: ne dixwî sava-rê ne diçim hawarê, jê ber ko em kurd qedrê qenciya ko digihe me gelek bilind digirin, vî qenciye jî bîra na kin, û deydîndê qencîkerê xwe dimînin.

Beriya ko ev gerê mezî destpê bike, Hevalbendan gelek qedrê tîrkan girtî bûn, di pîrsa tengava Ceneq-geleyê de û ya Iskenderonê arikariya wan kirin, û tîrk bû bûn kurd Ewriyayê aqil.

Pîştî ko ev gerê mezî destpê kir, Hevalbendan jî nû ve û bi her awayî qedrê tîrka girtî û arikariya wan kirin, zad û zexîre, sîleh û cebîlxane, çek û posatên şerî bi pîranî hatine rêkirin Tirkiyayê. Tîrka savara Hevalbendan xwariye û divê herin hawara wan.

Rast e ko hêviya xelasiya elemana jî perîşaniyê ne maye; Ordiyên Hevalbendan, li her derê zora eskerên elemanî dibin, û tîrk arikariya Hevalbendan kirin an ne, eleman û Japon û destbrayên di wan ên biçûk de bîne şerpeze kirin.

Lê heke tîrk jî ketine şer, dema perîşaniya Mihwerê nîzîngtir bibe, û ev jî tişteki heja ye.

Îro ko dema çûna hawarê hatiye, tîrk dibêjin: eskerên elemanî di nîzîngî sinorên me de ne, yê Hevalbendan jî wan sinorên dîr in, çek û posatên ko Hevalbendan dane me hindik in, tîrî me na kin, tîrkiye welatekî feqîr e û mîhîatî ticareta elemana ye; û qesda Urîsa çîye em nîzînan in hisaba jê dikin. Ji xwe tîrk her çend jî pîr na bîjin jî her tiştî bêtir, ji pîrsa Urîsa bîmad in.

Nivîsevanê A.F.I. qala wan tiştan dike û dinivîse: tiştên ko tîrk dibêjin ev in. Di Londrê de gava mirov jî peyayên selahiyetdar hal û hewala tîrkan dipîrsin ew bi ziravî dikenin.

Ma'zeretên tîrko nas in, lê di Londrê de tîrê bîhîstin: heke tîrk ne ketine şer û dema zelerê de, ne di nav Hevalbendan de ne, gelo di pêşiya Urîsa de halê wan siviktir an girantir bibe? Dewleta ko dikeve şer, divê çavsoz be, şer bê taluke nabe.

Gotina me a kurd a ye, ne dixwî sava-rê ne diçim hawarê dibe, lê ez dixwî sava-rê û na çim hawarê ne îşê ciwanmêra ye. Emê bibînin, wê çawan bibelî...

DANEZANA SOVYETI

MOSKÛ:— Şevê çûyî Serfermandariya sovyetî, danezana jêrîn belav kirîye: leşkerên eniya Ukranyayê êrîşên xwe, pêş ve ajotîne û gelek gund û avahîgeh û serbajarên Kamenetz, Podolsk û yê Zbarze standîne. Qîwetên me di pêşveçûna xwe de rîya Proskurov û Tarnopolê a heja, bîriye. Leşkerên me di 5-ê Adarê 203 tang, 250 top, û zehf çek û posatên dijmin ên din xira kirine; 16.000 kuştîyên dijmin na li erdê mane û qîwetên me sê hezar hêşîr girtine.

CEZAYIR:— Qerageha Hevalbenda a mezî li Efrîqa Bakurî dide zanîn: Ji ber nexweşiya hewayî, duhî, di eniya talyanî de tevdanên qîwetên hewa û reşayîyê hindik bûn. Leşkerên serpira Anziyê êrîşên elemana ên biçûk paş ve birine. Yekîneyên Ordiya heştan, jî di gerên bi erd ve gîrêdayî de, qîwetên neyara şkenandîne. Di qada Ordiya Pêncan de, jî tevdana kewî û sedmêran pê ve tu tişt ne qewimîye.

MOSKÛ:— Bi awakî resmî didin zanîn ko eskerên rûsî Vêşenets standîye.

LONDRE:— Refên emîrkanî ên mezî ji bombeavêjên giran bihevketî serê sibehê dirêjî Berlînê kirine. Şevê çûyî jî Berlîn bi destê bombeavêjên Muskitos an hatiye bombardîman kirin.

Qîwetên hevalbendan ên hewayî jî nû ve hezar ton bombe berdane hejagehên payetextê elemanî.

NÛ DELHÎ:— Bi awakî resmî didin zanîn: leşkerên hevalbendan di destên perawan de, li nîroyê Mongdawê êrîş qîwetên japona kirine û xesar gihandîne wan. Di nevala Kaladanê de tevdana eskerên Japonî dom dike; her çend jî di eniya Bîrmanyayê de şerîne xurt çênebûne.

CEZAYIR:— Di cengê serpira Anziyê de 24.000 şerovaniyên elemanî jî qîwet ketine.

Fenlandye

Weşington— Rojnameyên emîrkanî dibêjin ko di nav çend rojen ko di pêşiyê de ne Fenlandye, dest jî şerî bikîştîne û Sovyetîstan û Fenlandiya li hev bîne.

LONDRE— Meha borî balafirên Hevalbendan di Behra Edriyatîkê de 30.000 ton mezî, gemiyên dijminê binav kirine.

WEŞINGTON— Di nav du salên şerî de karxaneyên emîrkanî 150.000 balafir çêkirine.

LONDRE— Bombeavêjên emîrkanî ên giran serê sibehê bi ser axa Germanistanê de girtîne û li hejagehên bakur-roavayê vî erdê xistine, kitkîten vî erîşê hej ne nas in.

ZEHF GEMÎ

Meha sibata borî destgehên emîrkanî çêkirina 134 waporan qedandîne, 70 hebên wan jî Upê Libertî ne, her yek jî wan 10.000 ton mezî e.

WEŞINGTON Qîwetên emîrkanî, di giravên Emîraliyê de, êrîşêke japonî a nû paş ve birine û di vî navê de 3.000 eskerên japonî şafî kirine. Ji leşkerên emîrkanî 61 şeravanî hatine kuştin û 244 heb jî brîndar bûne.

Di Meha Sibatê De

Weşington— Meha Sibatê febrîqeyên emîrkanî 1.760 balafir çêkirine.

Weşington— Di civanê rojnamevanan de Serekîmîhr Rûzvelt elam daye ko sêyekê stola talyanî wê bête dayîn Sovyetîstanê.

LONDRE— Refên brîtanî û emîrkanî ên xurt, bi şev û bi ro dirêjî hejagehên axa Germanistanê dikin. Berlîn, Bon, Kolonye û zehf şaristanên din, jî nû ve hatine bombardîman kirin. Xesarên ko li bajarên Bon û Kolonyayê çêbûne gelek diwar in.

Di roavayê Krivoy- Rogê de şerîne xwîdar çêdibin.

Leşkerên rûsî, xelên elemana neqeb kirine û ketine çeper û asê gehên elemana.

LONDRE— Wezareta brîtanî a hewayî dide zanîn: şevê çûyî refên me ji bombeavêjên giran bihevketî di bakurê Parîsê de, li karxaneyên balafirên xistine, û Frensa Bakurî de ji febrîqeyên din dane ber bomban. Raporen pêşî xuya dikin ko derb çêbûn xwe girtîne, ji aliye di Muskitos an dirêjî hejagehên Germanîstana roavayî kirine û torpîl rêqandîne çem û robarên dijminê. Mekîneyên me bi tevayî vegeyriyane warên xwe.

LONDRE— Welapîrwerên polonî, hefta borî 21 zabîten elemanî kuştîne.

LONDRE— Qerageha yugoslaviyê a mezî ya xelasiya Welêt elam dide, ko di axa Slovenya, Bosne, çîyayê Reş û Dalmacyayê de şerîne nû çêdibin.

CEZAYIR— Bi bombardîmana roja îne, xesarîne giran gihandî Stasyonên Romayê.

DEMA NIHA

MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYÊN SER Û AŞITIYE

CENG & BIHINGEH

STOKHOLM—Tête seh kirin ko payetextê Estonyayê Talîn hatiye vala kirin.

LONDRE—Pêşkarê D. N. B. ê eskerî duhî êvarê digot, ko leşkerên elemanî ber hi nroyê Narvayê ve, xwe bi gûnda kişandine, bi qesda kurtkirina eniya xwe.

LONDRE—Wezareta britanî a hewayî dide zanîn: Bofeytersan, şevê çûyî di pêşiya peravên Norvecistanê de êrîşt qeflewaporeke dijmin kirine, û jê waporek dane ber torpîlan.

MOSKÛ—Danezana sovyetî a duhî êvarê elam dida ko, leşkerên rûsî yên eniya Ukranya yekemîn êrîşên xwe pêşve ajotîne û 200 şaristan û avahîgeh standine.

LONDRE—Qerargeha Emerikanî a mezin bi awakî resmî elam dide ko duhî gava bombeavêjen emerikanî û neçîrvanên Hevalbendan dirêjî Berlînê kirine, 176 neçîrvanên elemanî hatine xistin erdê, 90 hebên wan bi derbên bombeavêjen emerikanî xira bûne.

LONDRE—Rahetiya Berlînê ne maye, refên Hevalbendan bi şev û bi ro êrîşt payetextê elemana dikin û di nav çar rojan de, Berlînê sê caran, bi awakî gelek xurt hatiye bombardîman kirin. Bombardîmana dawî de, 176 neçîrvanên elemanî hatine xira kirin, 68 bombevêj û 11 neçîrvanên Hevalbendan venegeriyane warên xwe.

LONDRE—şevê çûyî bombevêjên britanî ên giran, 25 kilomêtrî roavayê Parîsê de li hêjagehên rêhesinan xistine. Mekîneyên britanî bi tevayî vegeriyanê qerargehên xwe.

CEZAYIR — Qerargeha Hevalbendan a mezin di Eniya Behra Spî de, dide zanîn: Di eniya serpira Anziyoyê û ya Ordiya Pêncan de tevdana kewete û sedmêran dom kiriye; di Kasinoyê de çend qirênên xurt çêbûne. Yekîneyên hindî yên Ordiya Heştan, du êrîşên elemanî ên biçûk bi gûnda zivirandine, xesar gihaye dijmina. Nexweşiya hewayî tevdanên balafiran aciz dike. Neçîrvanên me ên bombeavêj li şargêh topçiyên neyara xistine, û di bakurê serpirê de, û di nîzîngî Romayê de rê û rêhesinên dijmina dane ber bomban.

MOSKÛ—Di axa gehîneka rêhesinan ya Tarnopol û Proskurovê de, di nav bira tang û peyadan de, şerîne zor û xwîndar çêdibin. Leşkerên generalê elemanî von Mansteyn bi qesda parastina wan her du qerargehan bi rik pêdîdin erdê.

Strana Kurdi

SALIHO

Saliho pismamo lo, ezê bi Diyarbekira şewitî ketim, li tîlê xim.

Ezê tîlê li tîlê bikişnim, ezê bigînim Enqera xopan belkî efwa pismamê xwe binim.

De rabe pismamo lo, Dîlê min di dinyê de tune ye, de rabe pismamo lo;

Girtiyê hefsawa lo, û şenî-qandin, li qoce Diyarbekira şewitî li korta girtiya, bin dara çînarê, bi destê neyara wa lo;

Xwedan xêrek di bajarê Diyarbekir de tu ne ko bi destê pisma me min bigre, ji hefsxana xwînya derxe.

Salih digot: dotmamê de rabe, ji devê hefsxana Diyarbekir, rabe,

eybê;

Çunkî min digot: tu ji malek qenc î, gava xelkê bê: pismamê te şenî-qandin, li qoce Diyarbekirê xelkê bê qebheta pismamê te çî ye.

Durê dotmamê, tu dibê qebheta pismamê mi tu ne, Sê qebheta pismamê te sebeba Kurdistanê mada Şêx Sêdê.

Işallah dotmamê li wê dinyê gelekî ji mi re xêr û sewabê;

Diyarbekira şewitî bi şewite di kortê de walf û Elî Salib reîsê îstîqlalê pêre;

De rabe pismamo, lo; de rabe girtiyê hefsawa lo;

Sed û yek salek îdam dawa daliqandin, li Diyarbekir bi destê dijmina wa lo...

ŞÊXÊ KOR

STRANA BAVÊ FEXRO

Bavê Fexro mi stra bû, te ji mi re tew kir, gundî û malîya, bi mi û te bû, te derew kir... Way li minê, way li minê, gîdî delal, bavê Fexro, l...

Ji Farqênê heta Hadiya çiyayê Mezin pala xwe da banê çiya Dera Mezin, pala xwe da hûr devîya ji xwe re binêre li konreşa, keriyê mîha; îro sê ro bavê Fexro nexweş e li nav çiya. Way li minê, way li minê way lîminê gîdî delal... bavê Fexrol

Ezê bi çepîlê Fexro bigirim, birevînim, bavê Kerengo gundê ezediya. Kê go bira Kerengo genî bûye ji kuliya; çavê min bavê Fexro kul bû bû ji toza dû kerîya. Way li minê, way li minê, gîdî delal bavê Fexrol

Wextê ez pîr bûm, ez pîr ez,

bûm, wextê ez bi dergistî bûm, ez meqbûl bûm, wextê ez ketim bin darê kopekê mêrê xerab, ez kal û pîr bûm!

Way li minê, way li minê, gîdî delal, bavê Fexrol Ev buhar e, xweş buhar e bavê Fexro, li gence siwar ne be dîn û har e. Mi di hatî, cewaba nexêrê, go Mihemedê Fexro, bi sê gullayên tematekê brîndar e.

Way li minê, way li minê, gîdî delal, bavê Fexro!

Ji Helebê wê de Şam e, şal û şapikê bavê Fexro bi şal qitmirê ne timam e, gîdî delal, gîdî delal. Way li minê bavê Fexrol

Ji Farqênê, heta miqabilê mala me tev de distira, mi ji te re go xwîşkê, te go bîral...



Koça General DE COL. Dota General Mina Bavê Xwe Bi Eşq û Keyret Xidmeta Welatê Xwe Dike.



Gemiyên Bi Çar: Di Behrên Dinyayê de Gemiyên Biçar Ji, Yên Ko Bi Xurtiya Bê Dimeşin, Bikerî Dan û Standinê Tê.

Gîdî delal, gîdî delal, way li minê way li minê, bavê Fexrol... Ezê herim wê Amûdê wê çarçiyê. Mi di xortik çû wê serayê wê belediye; Mi li eslê vî xortî pîrî,

go Mihemedê Fexro, şerê çiyê...

Way li minê, way li minê gîdî delal, bavê Fexro!

Ez hiliyam tu bihill...

Du Cengên mezin De

Cengê mezin î kevî de li sala 1914—1918 an, li gora hejmarîyarên resmî 1.700.000 şeravanîyên Urîs, 1.357.000 frensîz, 908.000 britanî, 650.000 emerikanî, 1.773.000 elemanî, 1.200.000 nemsewî hati bûn kuştin. Di vî şerî de di nav bira salên 1939—1943-yan de 4.500.000 şeravanîyên sovyetî, 5.000.000 elemanî, 1.000.000 ji dewletên Mihwerê ên biçûk, 185.000 frensîz, 100.000 britanî, 60.000 emerikanî hatine kuştin.

LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wkfa Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire : EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

KURDISTAN

- II -

Les principales ressources du Kurdistan sont l'agriculture et l'élevage. Les régions de plaines et les plateaux produisent en abondance, blé, orge, lentilles et maïs ; on trouve aussi du riz dans les contrées marécageuses ; le coton croît également, mais en quantité moindre. Dans la montagne, c'est le jardinage qui l'emporte, arbres fruitiers, légumes et tabac viennent en abondance autour de chaque village, sur des champs en terrasse, bien abrités du vent.

Le cheptel comprend surtout des ovins et des caprins (chèvres dites d'Angora), ainsi que quelques bovins et des chevaux.

La récolte du miel, et à certains endroits, celle de la noix de galle et de la manne, fournissent en outre un complément important aux produits du travail régulier. L'artisanat est surtout familial ; tapis et feutres constituent les spécialités les plus connues.

Le sous-sol du Kurdistan renferme d'immenses richesses minières : fer, plomb argentifère, cuivre, zinc, pétrole. La plupart, sauf le pétrole, régulièrement extrait par des compagnies étrangères dans les régions de Kirmanchah et de Kirkouk, ne connaissent encore qu'une exploitation très primitive.

LES KURDES

Nous ne possédons pas de statistique donnant une idée exacte de l'importance numérique de la population kurde. Tous les chiffres qui sont généralement indiqués ont le défaut de ne reposer sur aucun recensement complet ; il arrive aussi qu'ils soient délibérément déformés dans des buts de propagande. Il ressort toutefois des estimations les moins partiales que le nombre total des Kurdes doit osciller autour de huit millions, non compris ceux qui résident en dehors du Kurdistan proprement dit.

Dans l'ensemble, et si l'on excepte quelques régions occupées par de très anciens autochtones, ultérieurement assimilés, les Kurdes sont de souche indo-européenne. Bien que tout aussi facile à reconnaître, le type kurde est aussi peu susceptible de recevoir une définition générale que le type français ou que le type britannique. Traits fortement accusés, nez aquilin, forte carrure, musculature développée, telles en sont les caractéristiques essentielles. Mais, tandis que dans certaines régions, on observe une prédominance d'individus de haute taille, dans d'autres, on rencontre surtout des hommes de stature moyenne. Dans beaucoup de can-

tons, les blonds au teint clair et aux yeux bleus ou gris sont en majorité, ailleurs, ils ne constituent plus que quelques exceptions, au milieu d'une population brune aux yeux noirs, et de peau légèrement basanée.

Le costume kurde comporte, dans les pays de montagne, un large pantalon, fait d'une étoffe de poil de chèvre, et retenu à la taille par une ceinture de cotonnade ou de soie. Il est complété par un gilet et par une veste courte, qui s'arrête aux reins. Les habitants de la plaine remplacent le pantalon par une sorte de caleçon de toile blanche que recouvre une tunique de même tissu. Mais, partout, la coiffure nationale est un turban dont la forme, le ton et le volume varient suivant les contrées.

Les femmes portent une jupe très ample, souvent brodée ; elles ne sont jamais voilées, et se coiffent d'un fichu de tête, enroulé autour d'une calotte. Elles tressent leurs cheveux, qui retombent en nattes sur leurs épaules. Hommes et femmes ont un goût particulier pour les couleurs vives, rouge, bleu, vert, jaune ou orange, qu'ils savent d'ailleurs marier à merveille : peu de spectacles sont aussi pittoresques que celui des foules kurdes réunies aux abords des villages, les jours de fêtes, alors que les rondes mêlent jeunes gens et jeunes filles, et que les chansons retentissent joyeusement aux échos de la montagne.

LE CARACTÈRE KURDE

Le caractère kurde a fait l'objet des appréciations les plus diverses, et souvent les moins justifiées ; les dires des citadins orientaux, dépayés et mal à leur aise, dès qu'ils franchissent les portes de leurs villes, les mésaventures de certains voyageurs, sont à l'origine de légendes malheureusement trop répandues, et qu'il est nécessaire de corriger par le témoignage des étrangers qui ont le mieux connu et le plus longtemps pratiqué les Kurdes, comme Soane, Hay, ou Hamilton.

En réalité, les Kurdes se distinguent par des qualités remarquables en Orient.

Le moindre de leurs hameaux de montagne charme par sa propreté et par sa coquetterie ; les intérieurs les plus pauvres, décorés de tapis aux couleurs vives, sont pleins de gaieté, et le voyageur est toujours sûr d'y trouver la plus franche et la plus cordiale hospitalité, dépourvue de contrainte

DIX ANS APRÈS

LA MORT D'ALBERT 1^{er}

par CHARLES d'YDEWALLE

La nouvelle de sa mort éclata comme un coup de foudre. J'étais à Bruxelles alors, entre deux voyages, et me réveillai, le 19 Février 1934, consterné et en somme stupéfait de ma propre consternation. Autour de moi, les gens se regardaient, se téléphonaient, éclataient en propos touchants. Un grand deuil de famille rassemblait soudain tous les Belges, surpris par leur propre chagrin.

Ce fut bien plus fort quand, l'après-midi, les nouvelles parvinrent de l'étranger. Un coup de baguette magique ramenait brusquement l'attention de l'Univers sur le Palais de Lacken. Le «Times» et le «Temps» lui consacraient leurs éditoriaux. Les Belges avaient oublié qu'ils possédaient parmi eux un aussi grand homme. Il arrive, dans les villes historiques, que les meilleurs citoyens oublient la présence d'un tableau de maître illustre.

Beaucoup de Brugeois négligent depuis des années les tableaux de Moutinck. Ils sont habitués. Le monde et la Belgique s'étaient habitués à l'aurole du Roi Albert. Sa mort fut une catastrophe qui révéla la conscience humaine. On vivait alors en léthargie. Rappelons-nous 1934. L'espèce humaine parlait peu de Droit et de Justice à cette époque et si elle en parlait, c'était pour s'excuser de s'en soucier si peu. Le Roi Albert représentait dans la longue série des monarques de l'Histoire, celui qui ne triche pas, qui n'a jamais triché et qui ap-

porte dans la conduite des affaires nationales la simplicité courtoise du gentleman. Il demeure entendu, pour beaucoup, que c'est à raison d'Etat prime toutes choses. Machiavel et Frédéric II ont formulé cette doctrine mais beaucoup, qui ne sont pas doctrinaires, la pratiquent sans mot dire, et avec un égal cynisme. Le Roi Albert, c'est le démenti au mensonge et l'apothéose de l'Honné-

Le monde avait été surpris par l'intrépidité de la Belgique. Tout permettait de prévoir son héroïsme, mais enfin, sait-on jamais ? La nature humaine a de si curieux inattendus. Beaucoup de rapports diplomatiques datés de 1913, publiés depuis, témoignent d'un grand scepticisme dans l'esprit des grandes Puissances. Par surcroît, les Belges, très bien informés des choses d'Allemagne, connaissaient la valeur militaire de l'Empire de Guillaume II. Le Roi Albert savait très bien qu'en repoussant du pied l'ultimatum allemand il risquait sa tête. Il ne se contentait pas d'être courageux. Il faisait son métier de Roi.

Son caractère était moins connu encore que sa politique. Cadet d'une branche cadette de la maison Royale, il avait grandi dans l'ignorance du métier qui l'attendait. Léopold II, son oncle, avait un fils qui mourut à l'âge de dix ans. Le Comte de Flandre, son père, devenait héritier du trône. Il avait deux fils. Ce n'est qu'après la mort accidentelle de l'aîné le Prince Baudouin, que le Prince Albert devint héritier présomptif.

(à suivre)

comme d'emphase. Les jardins et les champs qui entourent le village sont soigneusement tenus ; par un labeur acharné et souvent, dans des conditions ingrates, le paysan leur fait rendre le maximum. Il est d'ailleurs profondément attaché à son pays natal, et ne s'expatrie, même pour trouver une vie meilleure, que lorsque les circonstances l'y obligent absolument.

Travailleur infatigable, le Kurde est en même temps un combattant réputé. Endurci par un climat rude mais sain, il supporte aisément les fatigues des campagnes les plus dures. Rien ne lui plaît autant qu'une belle arme, et il aime par dessus tout s'en servir. Un proverbe déclare : « Mieux vaut la guerre que le désœuvrement ». Bon tireur, le guerrier de tribu cherche généralement à économiser ses munitions, et à tuer son adversaire, plutôt qu'à l'effrayer par une fusillade violente mais mal ajustée. Cette méthode, fort différente de celle qui se pratique d'ordinaire en Orient, où les rencontres sont plus bruyantes que meurtrières, lui a valu un renom de cruauté entièrement injustifié, par ailleurs.

A son énergie native, le Kurde joint la franchise et le respect de la parole donnée ; sobre de mots, il ne se vante jamais et déteste les discours inutiles. Son laconisme l'a fait parfois taxer de stupidité par ses voisins arabes ou persans, grands amateurs d'éloquence. Pour,

tant, tous les Européens qui ont été en contact avec des Kurdes savent que ces derniers possèdent un grand bon sens, qui ne va pas sans une certaine finesse d'esprit, et qu'ils apprennent toujours très vite et à fond ce qu'on a l'occasion de leur enseigner. Ils aiment d'ailleurs s'instruire ; nous citerons simplement l'exemple des porteurs de Beyrouth qui abandonnent chaque mois une partie de leurs maigres revenus pour entretenir un cours du soir assidument suivi.

Bien entendu, les qualités que nous venons d'énumérer n'excluent pas certains défauts : le Kurde a les siens, comme tout le monde. Il est voiontiers têtue, indiscipliné, batailleur, et surtout très vindicatif. Ces travers sont encore accrus par un code d'honneur très strict, qui n'admet le pardon d'aucune injure, et qui érige la vengeance en devoir sacré. C'est ainsi que de génération en génération, et pour des raisons souvent futiles, des haines féroces opposent certaines familles les unes aux autres. Ajoutons que, sauf dans le cas d'homicides par imprudence, la plupart des tribus se refusent à accepter le prix du sang : seule, une réconciliation bienveillante, scellée par un mariage, peut mettre fin à une querelle qui a causé mort d'homme, et l'on ne recourt que rarement à de tels arrangements.

ROBERT SURIEU

(à suivre)

DI WELATÊ ZEMBEQÊ GEWIR DE

Nivîsevan

Grîgorî Petrof

18

Wergerandok

Qedri Can

Ew tiştên ku de û bavên wan, ji wan re dibêjin: me kin... û de û bav bi xwe dikin, na keve serê zarekan.

Paşê di wan de ev qenacê çê dibê:

Dê û bav, bi awakî dibêjin, bi awakî din dimeşin. Ji ber vî yekê, fîtimada wan, bi gotinên de û bavê wan na mînin. Êdin, guhê xwe nadin gotinên: «Vî karî bike, yan vî karî me ke.»

Ji alîkî din, de û bav gazina dikin, ku zarokên wan hêj teva biçûkayiya xwe, ser-bîgîya dikin, û gotina de û bavê xwe digîrînin. Ew, bi xwe nizanin, ku ew bi xwe, dibin sebebê vî tiştî. Hûn bawer me kin, ku bi lêxistin, bi tekdîr û tehqîran zarok çê dibin, na. Lê hemberê zarokên xwe, wisan hereket bikin, ku ew bi xwe, meziyetê we bibînin û ji we hez bikin.

Hinek de û bav, li qiyafetê xwe, li paqîjiya dest û lingê xwe mîze nakin..., di peyv û galgalê xwe de, guh na din nezaket û nezahetê. Hinek ji ji zarokên xwe re dibêjin: Hûn dibînin ku bavê we çawaye, ka binêrin bê diya we çî jine? 15-20 salan, zarok di nav vî çiravê de tên hiştin, paşê ji merivên nav sale, dibêjin, ku: Çima zarokên me bê basik di mînin, ber bi ezmana nafirîn? Ez, ji de û bavê wisan dipirsim:

—Gava we xwest ku hûn zarokên xwe terbiye bikin, ji bona bilindbûna wan, we basikên eyloyan dan wan, yan we basikê wan peritandin? Gava ku zarokên wan mezin di bin, de û bavê wan ji bo pêşî (îstîqbal) a wan ji xeyalan li ser hev dafînin; di xwazin ku kurên xwe bikin muhendis, m'ê-mûr, tucar, tuxtor, awîqat, û ya: xwediyê sen'etêkî baş. Ji keçên xwe re ji, li mîrekî zengîn digerin. Ji bona zaroyên xwe tenê fikra refah û bextiyariyê dikin. Û bi vî awayî dibêjin ku qey wacibê de û baviştî qediya. Ji bo vî yekê (Le Tolstoy) ev gotinên hanê en qenc kirine;

—Ji bê rêzana jiyînê yek jê ev e ku, her kes di jiyîna xwe de, tenê dixwaze bi gihêje refahê. Lê refaha jiyînê û kêrbûna xebata bi dest, û bi saya xebata xwe, rêzana jiyîna xwe nayîne bira xwe.

Her kes dixwaze, ji jiyînê parekê bistîne û na xwaze tiştêkî bigrê. Gelek meriv bi xwed-kamî, bi xesb û tufeylî fî dikevin jiyîna civatan. Hikmeta jiyînê, di vî tufeylîyê de dibînin. Hikmeta jiyîna wisan, bi salan ve, di nav mûhîte malê de, bi zarokan digre. Kî di bî sebeb? Dê û bav!

Ew zarokên ku vî telqînê distînin, gava mezin dibin, xwedbîn, çavbirçî, gehwet - perest, tîral dibin. Li ser dawiyê ev xortên hanê, bi hezkirin, girêdayî na mînin. Bê qeyd di mînin. Di wan de hezkirîna welat, millet, fikrên merivanî û malbatî, hurmeta xebatên qenc pîda na be. Dê û bavê xwe ji bi hezkirîneke rast hez na kin. — Hûn çî tov bi kin hûnê wî biçînin.

Hûn çî bibirêjin, hûnê wî bi xwin...

Heke hûn ruhê xortaniyê mîna zeviya ne çandî, bibêlin, ewê tê de histirî û kelem qîn bibin.

—Dê û bavê ku heq û dilê zarokên xwe bê çandin dihêlin, ne tu wijdane. Heta ez kanim bibêjim, ku ihmalek wisan bî exlaqîyê, cinayet e. Terbiya— stendin û ne tenê bi destê de û bavan e. Digel vî qasê bendewariya civat û dewlete ji —bi germî— divê.

—Heta hûn dixwazin qanûnê bîngêrî qenc çê bikin, heta hûn dixwazin di bijartîyê de selahiyetê bi dest ehalî berdin, heta hûn dixwazin, bawer bi pîrensîpê Komonîzîm û sosiyalizîm bikin... heke zarokên we, mîna di dixwaze, terbiyê negirin, bi heqî bikevin nava jiyînê jiyîna civakî û parlamanto, giş bî ronî û bi zîngar dimînin.

Me'mûrê ku ji nav vî tov, derkevin ihmalkar, wezîrê wan canbaz dibin, me'ûsê wan ji didin pî fêda xwe û li dî wê baz didin. (Hêj heye)

PÊJINEN DINYAYÊ


Xebat - Fidakarî - Serfirazî - Serdestî



Şer Di Nav Devî û Daristanan De Ji Dom Dike.



Topên Zirehpûşan Ên Dijwar Hêjagehên Dijmîna Didin Her Gullan.



Balafîreke Elemanî Hatiye Xistin Erdê, Zaro Lê Dînerin.

TÊTÎ Û FÎL

Hebû têtîk û fîlek. Rabû têtî hêlîna xwe li tenîştê gevizka fîl çêkir, û ji fîl re got: ya brayê fîl, min hêvî ji te heye, hêlîna min li tenîştê gevizka te ye, û çêlikên min hûr in, wextê tu xwe digevizîn, tu miqateyê li hêlîna min biki, ji bona ko tu çêlikên min ne kuji.

Rabû fîl got: ser çavê min brayê têtî.

Têtî rabû û çû çolê, ji xwe re biçêre an bigere, rabû fîl nêrî ko têtî çû, xwe li vî alî, li wî alî, qulipand, xwe li ser hêlîna wê de, qulipand, û çêlikên wê kuştin, û hêlîn xira kir.

Rabû têtî hat, nêrî ko hêlîna wê xira bûye û çêlikên wê hatîne kuştin.

Ji fîl re go: mi hevqasê tenbiya hêlîna xwe û çêlikên xwe li te kir, û rabûm ez çûm, û te pag min re, tî hêlîna min xira kir, û

tî çêlikên min kuştin, çî heqê te li wan hebû ko te ew kuştin?

Fîl go: mi kuştin, mi kuştin, çî ji te tî, teqîr me ke!

Rabû Têtî, ji fîl re go:

Heke ez vî ji te re bihêlim, bila ev kofiya min, ne li serê mi be; û têtî bi hewa ket, û çû cem mezinê teyrê, û jê re got, em teyir hemî destbrayê hev in, û erê ez biçûk im, lê ez ji teyirîm û ji we me, û hal û mesela çêlikên xwe ên kuştî, gote wan,

Rabû teyrê haz emrî ser her du teyrê dubira kir û ji wan re go: herin ewê ko ta'dayî li têtî kiriye, heya wê hîllînin. Rabûn her du teyrî û têtî bi wan re, bi hewa ketin, û hatin ser cihê ko fîl lê bû; û têtî ji wan re go: bînerin wîha ye, fîl di gevizkê de ye.

Rabûn her du teyrê dubira, yek ji wan bi hewa ket û ê din daket û li çavê fîl xist, çavê wî

derxist.

Fîl rabû, xwe qulipand aliyê din, ji êsa çavê xwe, teyrê din ji jor de daket, û li çavê fîl ê din xist û ew çav ji derxist.

Rabû têtî daket cem fîl go: ma mi ji te re ne go, ez ji te re na hêlim? fîl lê vegerand û go bi Xwedê te kir û te teqîr ne kir. Têtî jê re go: hîn, hîn, hîn ez bi te bikim:

Rabû fîl kor bûye, cem ji di bînyê re heye, wextê ko fîl dibê, li qur û qura dengê req û beqa dire ser cem, avê vedixwe.

Rojekê têtî, çû ji req û beqa re go: ez hêvî ji we dikim, fro

honê bîn, û bin vî tehta bilind, bikin qur û qur; emê ên biçûk divê qedrê hev û du bigirin.

Rabûn req û beq hatin bin tehtê, û kirin qur û qur, fîl ji tî bûye, û nîro ye, dinya germ bûye, —li qur û qura dengê beqa dire ser cem, avê vedixwe—ra bû, dîsa li dengê van beqan çû ser cem, ew nîzane ko req hatine bin tehtê, Fîl hat li dengê wan, serserê tehtê û carekê, di tehtê wer bû û ket, fîl perçe, perçe bû; û têtî heya çêlikên xwe jê hilant.

A mîra wîha ye.

HUSNIYE MERZIKÎ